



Vaksîna xurtkirinê bi vaksînê mRNA (Pfizer/BioNTech, Moderna)

Vaksînên mRNA gelekî baş hemberî nexweşiya kovîd-19 ya razana li nexweşxaneyê diparêze. Lê, wê di kesên 65 salî û jortir de nîşan daye ev parastina vaksînê dikare di dirêjîya wextê de kêmtir bibe. Em li van kesan tewsiye dikin bi destpêka meha 4 piştî vaksîna dawîn vaksîna xurtkirinê li xwe bidin. Hîn jî ne zelal e gelo parastina bi lêdana derziyê hemberî nexweşiyên giran ên kesên jêrî 65 salî û cureyên nû yên vayrusê kêmtir dibe yan na. Ji aliyê din ve, parastina hemberî nexweşiya negiran û hemberî veguhezîna vayrusê bo hemû kesan û di dirêjîya demê de kêmtir dibe. Ev dikare angorî cureyê vayrusê zûtir yan hêdîtir rûbide. Loma, em tewsiye dikin hemû kesên ji 16 heya 64 salî derziya xurtkirinê lêdin.

Mebest ji vaksîna xurtkirinê çi ye?

Vaksîna xurtkirinê pergala ewlebûnê ya patojênê tîne bîra mirov. Ev dê parastina zêde ya bi lêdana derziyê vegeherîne rewşa berê û dirêj bike.

Vaksîna xurtkirinê li kê tewsiye dibe?

Bo baştirîn parastina mimkin hemberî nexweşiya giran a Kovîd-19 ya razandina li nexweşxaneyê, vaksîna xurtkirinê bo hemû kesên 65 salî û jortir tewsiye dibe. Bi taybet bo:

- Kesên 75 salî û jortir;
- Kesên 65 salî û jortir bi nexweşiyên demdirêj bi metirsiya¹ herî zêde ya nexweşiya Kovîd-19;
- Kesên niştecih û yên tîne malên perestariyê, malên muqateya niştecihbûnê, û cihên muqateya rojane bo kesên extiyar.

Vaksîna xurtkirinê dikare arîkar be parastina hemberî tûşbûnê û nexweşiyên ne-giran û dûhatên wan (wek mînak, bandora demdirêj ya Kovîd-19, ji dest dayîna kar) zêde bibe û bi awayê demkî gerîna vayrusê li kesên ji 65 salî kêmtir kêmtir dike. Loma, vaksîna xurtkirinê li hemû kesên 16 heta 64 salî jî tewsiye dibe.

Bi taybet bo:

- Kesên bi taybet zîyanbar jêr 65 salî bi nexweşiyên demdirêj bi metirsiya herî zêde ya bo nexweşiya giran a Kovîd-19¹.
- Niştecih û kesên jêr 65 salî ku tîne mala perestariyê, cihên muqateya niştecihbûnê, û cihên muqateya rojane bo kesên extiyar.
- Karkerên muqateya tenduristiyê bi tîkiliya rasterast digel kesên nexweş û muqatekarên kesên li ber metirsiya taybet.

Vaksîna xurtkirinê li hemû jinên ducanî jî ji sê mehên duyem ên ducanîbûnê û jinên şîr didin zarokan tewsiye dibe.

Kingê divê vaksîna xurtkirinê were lêdan?

Derziya xurtkirinê ji 4 mehan piştî ewlebûna tam a bingehîn bi derziya mRNA tê tewsiyekirin. Ewlebûna bingehîn a tam piştî van heyên:

- du doz vaksîna mRNA vaccine; yan
- tûşbûneke erêbûyî bi koronavayrusê + dozeke vaksînê ya mRNA herî kêmtir 4 hefteyan wêdetir (bêyî li dûhevbûna wê).

Ger enfeksiyona bi coronavirus re piştî vaksîlêdana mRNA ya bêkêmasî ya bingehîn hate pejirandin, qaîdeyên jêrîn tîne bicîh kirin:

- Eger tûşbûn di nava 4 mehan ji ewlebûna bingehîn de be, vaksîna xurtkirinê çarmehan piştî wê tûşbûnê tewsiye dibe.

Eger tûşbûna 4 mehan pirtir piştî derzîlêdana bingehîn hebe, lêdana derziya xurtkirinê gelek caran di vê demê de pêwîst nîne. Kîjan vaksîn û doz bo vaksîna xurtkirinê bi kar tê?

Di bingehê de, eger mimkin e, divê heman vaksîn bo vaksîna xurtkirinê wekî ewlebûna bingehîn were bikaranîn. Eger ev nebe, vaksîna din a mRNA jî dikare were bikaranîn. Eger vaksînên mRNA yên cuda bo ewlebûna bingehîn were bikaranîn, ya xurtkirinê dikare bi yek ji du vaksînan be.

Bo ewlebûna bingehîn jî, kesên jêr 30 salî tewsiye dibin bi tercîh vaksîna xurtkirinê bi Pfizer/BioNTech lêdin.

Bo vaksîna Pfizer/BioNTech, heman dozê didin bo vaksîna xurtkirinê ya ewlebûna bingehîn. Bo vaksîna Moderna, niv dozê bo xurtkirinê lêdidin.

Li ku dikarin vaksînê lêdin?

Kanton berpîrsên vaksînkirinê ne. Li malperê yan Xeta zanyariyan (Infoline) a kantona xwe binêrin (www.foph-coronavirus.ch/cantons) ku bizanin li ku dikarin navnivîsî bikin û vaksînê lêdin. Yan jî bijîşk, dermanfiroşê xwe yan dermanfiroşiyê bipîrsin.

Zanyariyên bermayî bo vaksîna xurtkirinê û vaksîna ewlebûna bingehînê yek in û hûn dikarin wan di vê faknameyê de bibînin «Zanyariyên giştî ser vaksînlêdana Kovîd-19 bi vaksîneke mRNA».

¹ Xişteya/tabloya 2, rûpel 11 ya pêşniyara lêdana vaksîna mRNA: *Pênaseyên nexweşiyê ji bo kesên ku di xetereya herî mezin de ji ber nexweşiyên kronîk tîne çêkirin (bi Almanî)*

